# PÊŞGOTİN

P.Dr. Hogir tahir tewfîq
P.H. Dr. Nizar eyûb hesen

Gotinek di navendên ekadîmî û giştî da belav bûye ew jî “kurdan di mêjûyê da çi dewlet nebûn” yan jî dewlet û mîrgehên kurdan di serdemên borî da (nîmçe dewlet) bûn û ne xudan biryara xwe ya merkezî bûn û ev gotine di serdemê serhildana dewletên neteweyî da li sedeyên 19 û 20 pitir belav bû, nexasme piştî kurdan neşîyayîn dewletekê bo xwe li ser erdê xwe (Kurdistanê) ava biken.

Li ser binaxeyê evê hizrê û evê boçûna dîrokê Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî biryar da ku konferansê xwe ya heftê li jêr navê “Dewlet û Mîrgehên Kurdan li Srdemên Naverast û Nû da” bigêrît da ku bi kûratî biçîte di nav jîyan û şaristanî û karîgerîyên ewan da û eva li xwarê kurtîyeke ji ewan dewlet û mîrgehên kurdan e ewên di çarçovê cografya Kurdistanê da peyda bûyî:

-1-

**Dewletên Kurdan li Serdemê Naverasta Îslamî da**

Di serdemê xîlafeta Ebbasî da pênc dewlet û dewletokên kurdan peyda bûn ku di rêvebirina karûbarên xwe yên navxweyî û derekî da serbixwe bûn, ew jî:

1- Dewletoka Rewadî (337-463h/949-1071m): Ew li Azerbîcanê li rojhelata Kurdistanê peyda bûye û eve kevintirîn dewleta kurdî ye li rojhelata Îslamî û paytextê wê bajêrê Tebrîz bû. Îbnî Esîr sebaret ewan wiha: “Kurdên Rewadî li Azerbîcanê peyda bûn û ew ji pêşkêş û berahîyên kurdan e” û ji girîngtirîn mîrên wan Mihemed kurê Hesênê Rewadî, Deysem kurê Îbrahîmê Rewadî, ebî’l-Heyca kurê Memlan.
2- Dewleta Şeddadî li Aran/Êrîvanê (340-595h/951-1198m): Dikevîte bakûrê rojhelatê Kurdistanê. Kurdan şîyan dewleteka serbixwe li Aranê ku parçeyeka ser bi herêma

Azerbîcan û Ermenistanê ye ava biken û ji mezintirîn mîrên vê dewletê: Mihemed kurê Şedadê Kurdî, Mihemed kurê Merzibanê Kurdî, ebû'l-Hesen Elî kurê Mûsayê Leşkerî.

3- Dewleta Hesnewîye li Hemedanê (348- 406h-959/1015m): Ji girîngtirîn mîrên wê, Hesnewîyê kurê Hesênê Berzigtinî, Bedrê kurê Hesnewîyey.
4- Dewleta Eyarî (Enazî) (381-511h/991-1117m): Li bajêrê Helwanê- Zehawî li nêzîkî bajêrên Celewla û Xaneqîn û Qesri Şîrînê li başûrê Kurdistanê hatîye danan. Ji girîngtirîn mîrên wê: ebû'l-Feth Mihemed kurê 'Eyaz, ebû'l-Şewk, el-Şewq kurê ebû'l-Feth Mihmed kurê 'Eyazî.
5- Dewleta Dostikî-Merwanî (373-489h/983-1096m): Li Dîyarbekir, li bakûrê Kurdistanê hatîye damezrandin û gelek bajêr bi ser ve bûn. Wek Sêrt, Xîzan, Heskîf, Cizîra Botan, Nisêbîn, Meyafarqîn, Melazgird û Ercîş.... Damezrandina wê li serdestê Bad kurê Dostikê Kurdî bû. Bad serkirdeyê kurdên Hemîdî bû û nasnavê (Babê 'Ebdullahî û Babê Şucaî) hebûn. Derbareyî wî îbn Esîr dibêjît: Ewî li tixûbên Dîyarbekrê gelek xezwe dikir. Ew xudanê rewiştekê mezin bû lewra xelk li dor wî kom bûn... Herwesa ew kesekê merd bû û pezê xwe ji bo xwarina xelkî ser dibirî. Lewra navûdengê merdînîya wî li hemî cihan belav bû. Vêca mirovên wî zêde bûn û herdemê destkeftek yan talanek bi dest kevtiba êkser li ser zelamên xwe dabeş dikir... û ji ber heza milletê wî yê kurd bo wî, ew di hukmê xwe da serkeftî bû". Herwesa dîroknivîs el-Fariqî dibêjît: "Ew zelamekê cebbar bû". Ji mîrên vê dewletê: Bad kurê Dostikî, ebû'l-Elî Hesen kurê Merwanî, ebû Nesr Ehmed kurê Merwan.

Pitirya van dewletokan li ser destê turkên Selcûqî piştî hêrişên wan bo ser cîhana Îslamî li dûmahîyên serdemê Ebbasî hatine jinavbirin.

**-2-**

## Mîrnişînên Kurdan li Serdemê Nû

Kurdistan li sedeyên 13 û 14 kevte ber hêrişên moxol û tetaran û pitirya deverên Kurdistanê li ser destê Teymûr Lengî (1336-1404z) hatine wêrankirin, ew Teymûrê gelek ji mîrgehên kurdan êxistîne jêr rikêfa xwe. Û piştî van rûdanan du dewletên turkmanî derkevtin ku hukim li Kurdistanê dikirin ew jî Qereqoyûnlû (pezê reş) (1380-1468m) ku bajêrê Tebrîz weku melbend bo xwe helbjartbû û Aqoyûlû (pezê spî) (1378-1501) ku paytextê wan Dîyarbekir bû. Paşî li sala 1508 Kurdistan kevte di bin rikêfa dewleta Sefewî. Lê ev rewşe gelek nevekêşa û li sala 1514 şerekê vebir li deşta Çaldîranê di navbera sefewî û dewleta Osmanî da rû da û ji encamê ewê pitirya Kurdistanê kevte jêr desthelata Osmanî da û beşa rojhelata Kurdistanê di bin hukmê Sefewî da ma û ev doxê dabeşbûnê heta sedeyê 20 berdewam bû.
Di qonaxa destpêkê ji serdemê nû da, her wek dîroknivîsê kurd Şerefxan didete dîyarkirin, di Kurdistanê da û li her du pişkên Sefewî û Osmanî da 48 mîrgehên kurdî hebûn û dibît girîngtirîn mîrgeh li Kurdistanê ew bin ewên Bidlîsî bi gotina "hakimên Kurdistanê ewên herçende bangeşeya sultanî û serbxweyîyê nedikir, lê hindek caran ewan bi tena serê xwe xutbe bi navên xwe xwandîye û pare bi navên xwe lêdayîne behsê ewan kirîye, ew jî: Erdelan, Hekarî, Amêdî, Cezîre û Heskîf bûn".

Ev mîrgehe her ji sedeyê 16 ta naverasta sedeyê 19 xudanê peyva dûmahyê di jîyana sîyasîya Kurdistanî da bû û dibît tiştê ji hemî pitir ev mîrgehe cîyawaz kiribît babetê

şaristanîyê bît ku pêşbirkîya hindek ji dewletên ewî serdemî dikir, ji ewan şaristanîya mîrgeha Bidlîsê her wek gerokê tirk Ewlîya Çelebî li 1655 behs kirî ku li serdemê mîrê ewê Ebdal Xanî Bidlîsê bazarekê ava û şarekê bi rewş bû ku çendîn qesr û pir û pertûkxane û ... tê da hebûn û li ewî demî ewî gotina xwe ya navdar got: “Ez gerokek im ku 40 sale li welatan digerm, lê ev tişte min li çi welatekê dî nedîtîye”.
Mijara şaristanîya kurdî gelek girîngtir e, ji ber ku gelek ji layenên ewê nehatîne vekolîn, herwesa babetê şaristanîya dewlet û mîrgehên kurdan di perawêza mijarên sîyasî da dihêne behskiri. Lê di rastî da şaristanî ew xodîke û astê hizir û avedanîya her milletekê dûr diket û millet û gel bi astê werara şaristananîya xwe û têgehiştina xwe bo ketwarî û pişikdarîya ewî di xizmetkirina mirovayetîyê da dihêne pîvan û bê guman kurdan li ewî serdemî şaristanîya taybet bi xwe ve hebû. Ji ber ku şûnwarên hebûna şaristanî li Kurdistanê hind gelek in ku heta nûke bermayên ewan bi çav dihêne dîtin û hijmara ewan hind zor e ku di şîyan da nîne hemû di pertûkekê da bihêne tomarkirin. Çunke bi rastî Kurdistanî dikevîte ser çîyayekî ji şûnwarên mêjûyî, lê kêmasîya şaristanîya kurdan ewe ku di demê xwe da nehatîne tomarkirin û rolê ewan yê dîrokî çi li Kurdistanê yan li dervey ewê bi dirustî nehatîye aşkera kirin.

## -3-
## Kevtina Mîrgehên Kurdî li Naverasta Sedeyê Nozdeyê

Nîva yekê ji sedeyê nozdeyê peydabûna sê bizavên mezin bi xwe ve dît ku ji layê mîrên kurd ve li dijî dewleta Osmanî hatine encamdan û armanc ji van bizavan berfirehkirina sînorê mîrgehên xwe û wergirtina pitir serbixweyîyê di biryaran da bû.

**Bizava yekê**: Ew bizav bû ewa ji layê Ebdurehman Paşayê Babanî (1789-1813) hatîye arastekirin û ew ji bi hêztirîn mîrên mîrgeha Baban bû. Ewî desthelat ji 1789 wergirt lê pitir ji şeş caran ji hukmê xwe hate ladan ew jî ji ber hevrikîyên navxweyî yan destêwerdan û leşkerkêşeya herdû dewletên Îran û Osmanî. Bihêztirîn serdemê ewî di navbera 1810-1812 bû demê daxwaz jê hatîye kirin ku bibîte walîyê Bexdad lê ewî red kir. Ebdurehman Paşa ji nişka ve li 1813 wefat kir û piştî mirina ewî mîrgeh berev lawazîyê çû û li sala 1851 hate helweşandin.
Hozanvan Şêx Rizayê Talebanî (1835- 1909) sebaret evê mîrgehê dibêjît:

le bîrim dê Suleymanî ke dar û mulkî Baban bû
ne mehkûmî Ecem ne suxrekêşî alê Osman bû

**Bizava dûyê**: Ew bizava mezin bû ewa ji layê mîrê Soran Mihemed Begî (Mîrê Gewre-Mîrê Kore) (1813-1836) hatîye encamdan. Ewî li destpêkê girîngî bi çêkirina çekan bi taybet topan da û piştî destnîşankirina bereyê xwe dest bi vegirtina mîrgehên Baban, Behdînan û Botan kir û bajêrên Kerkûk, Hewlêr û Sêrt standin. Di hindek ji jêderên dîrokî da hatîye ku hejmara leşkerê Mîr Mihemedî nêzîkî 130 hizar serbazan bû û piştî ewan serkeftinan dewleta Osmanî heweka mezin bi serokatîya walîyê Sêwas Mihemed Reşîd Paşa hinarte ser Mîr Mihemedî û ji ber nehevsengîya hêzê dewleta Osmanî şîya heta sala 1836 hukmê Mîr Mihemed û mîrgeha Soran bi dûmahî bînît.